R: 4

**Nameya "Mistefa Hicrî" bo "Ban Kî Mon"**



R:5

**Karesatek bi navê giraniyê**



R:7

**Remza serkevtinê, tifaq e**



R: 8

**Şevitandina daristanên rojhilata Kurdistanê**



Bidestveanîna Mafên Netewî
Yên Gelê Kurd Di Çarçoveya Îranek Demokratîk û Federal De

Hejmar: 190
5'ê Îlona 2012'an
Buha: 150 Tûmen

# Agirî

## Spasnameya hevpar

**PDK Îran û Komeleya Şereşgêrên Zehmetkêş ên Kurdistana Îranê bi boneya pêşwazî kirin ji rêketinnameya 21'Tebaxê, spasnameyek hevbeş belav kirin.** R:2

Duheftînameyek siyasî, civakî, çandî û giştî ye ku Partiya Demokrat a Kurdistana Iranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî

### Di 24'mîn Kongireya ES' de

# komîta Kurdî ava bû



**Roja 8'ê Xermanan ê kongira Înternasyonala Sosyalîst li bajarê "Keyp Tawn" a paytexta Komara Afrîqaya Başûr bi beşdariya heyeteke PDKÎ, bi serperestiya birêz Luqman Ehmedî nûnerê PDKÎ li Înternasyonala Sosyalîst de birêve çû.**

Di wê kongirê de li ser çendîn pirsên giring bi taybetî reformkirina Înternasyonala Sosyalîst û bihêzkirina vê rêkxirawê li guherînkariyên siyasî ên cîhanê de behs û gengeşe hate kirin.

Nûnerê PDKÎ jî di vê kongirê de li ser rewşa ku niha rejîma Îranê têde dijî, û li ser siyasetên PDKÎ derheq guhertinên di herêmê de ji bo beşdaran axivî.

Di roja duyemîn de jî komîteya nû ya Kurdî, ya vê rêkxirawa cîhanî hate pêk anîn.

Vê carê li Înternasyonala sosyalîst de, biryarek li ser pirsa Kurd li her çar parçeyên Kurdistanê de hate pesendkirin.

Hêjayî basê ye ku CHP'ê nerizayetiya xwe derheq vê paragirafa pesendkirî ku pêwendî bi mafê çarenivîsê ve heye, eşkere kir.

24'mîn kongireya Înternasyonala Sosyalîst roja 12'ê Xermananê piştî sê rojan karê berdewam û pesendkirina biryarnamên kongirê bidawî hat.

## Xeta Sor divêt bo Îranê were diyarîkirin

**Barak Obama bi awayek micit di nav hewildanan de ye ku hêla Sor ji bo programa navikî a Îranê diyarî bike.**



Li gorî nûçeya Elerebiye, serokwezîrê Îsraîlê ji deshilatên mezin daxwaz kiriye ku xetek sor ji bo binkeyên etomî ên Îranê diyarî bikin.

Binyamîn Netanyaho, serokwezîrê Îsraîlê welatên mezin ên cîhanê bi tundî rexne kirin, ku heya niha nekarîne bi awayek micid li hemberî programa navikî a Îranê de bisekinin. Ew axavtinên Netanyaho nîşaneya vê ye ku taba wan li hemberî Amerîka û hevalbendên wê de bidawî hatiye ku berdewam daxwazê jê dikin ku nabe êrîşî ser Îranê bikin.

## Îran xwe ji bo serkuta her şoreşek civakî amade dike

**Kêmiya budcê, û kêmiya paşekevtên erzî, her ji niha ve dezgehên ewlehiyê ên rejîma Îranê derheq egera destpêkirina şoreşê ji aliyê xelkê ve nîgeran kiriye.**

Li gorî raporan, li encama nemana paşekevtên erzî, dewlet nikare heqdestê karsazên xwe bide, û li encam de tê çaverê kirin ku nerazîbûn dest pê bikin.

Her di vê derheqê de, name ji bo tewaya dezgehên îdarî hatiye şandin ku heke rewş her bi vî awayî berdewam bike, renge heqê karsazan heya %50'î were kêm kirin, lewra divêt berpirsên pêwendîdar xwe ji bo berbirûbûna bi nerizayetiyan re amade bikin.



## Sergotar

### Hezîneyek zaf û tûrikê betal

**Selîm Zencîrî**

16'mîn civîna welatên bêalî li dema diyarîkirî a xwe li Tehranê de birêve çû. Civînek ku rejîma Îranê tûrikê xwe ji bo mifaha siyasî, piropagendeyî û aborî jêre amade kiribû û dixwast dabigre ji destkevt û xeyalan.

Lê berevajî wan xweşbaweriyan, civîna han ji çend aliyan ve hezîneyek mezin a madî, menewî, siyasî û ragihandinî da ser milê rejîmê.

Yekem, li warê aborî de têçûyek zaf li dor vexwendin û mêvandariya ji beşdarên civînê yemezaxt. Herweha bajarek 15-16 milyonî weke Tehranê bi qasê 5 rojan mîlîtarîze û teitîl kir û bi vê çendê jî derbek mîlyard dolarî ji peykerê aboriya Îranê xist. Ji hêla din ve jî dixwast peymanên ticarî bi qasê 60 mîlyard dolarî bona qerebûkirina daketina dahata neftê bide vajo kirin ku ew jî serî negirt.

Duyem, li warê ragihandinî de dixwast ku astek berfireh ji rûberê ragihandinan bi qazancê xwe dagîr bike, lê derevên wan, sansor û çewaşekirina axaftinên Morsî ew çek ji wan stand û riswayî û şermezariyek mezin bo rejîmê bi dû xwe re anî.

Sêyem, rejîmê dixwast xwe ji vê îzolebûna siyasî rizgar bike, ku ew jî tenê li asta xeyalan de ma. Herweha mijara Sûriyê jî gor dil û pilanên wan neçû pêş û nekarî rewatiyê bide cinayetên Esed û piştewanan jêre kom bike. Ne jî karî mijara pêpeskirina mafên mirovan û pirograma şerxwazaneya navikî a xwe veşêre. Ji ber ku Ban Kî Mon hişdarî da wan li dor serkuta sîstematîk. Hevdem rapora "IAEI" li dor pirograma navikî a rejîmê hat weşandin ku tam berevajî axaftina Xamineyî bû ku ragihand em li pey çeka navikî ninin û gelek beşdarên civînê ji vê metirsiyê da veciniqandin, tenê dîktator Mogabê nebe, ku heta dostên wekî wî hebin hewcehiya malxê malê bi dujminan nake.

www.arsivakurdi.org

# Nameya “Mistefa Hicrî” bo “Ban Kî Mon”

## Di bereberê seredana “Ban Kî Mon”, Sekreterê Giştî yê Saziya Netewên Yekbûyî de bo Îranê de, birêz “Mistefa Hicrî” Sekreterê Giştî yê PDK Îranê di nameyekê de “Ban Kî Mon” ji rewşa mafên mirovan li Kurdistanê haydar kir.

**Deqa nemeya han bi vî awayî ye:**

**Birêz Sekreterê Giştî yê “NY”!**

Em haydar bûn ku bi armanca beşdarbûn di civîna welatên bêalî de, hûn seredana Tehranê dikin û di vê derheqê de wekî ji zarê berdevkê we ve hatiye belavkirin hûn dixwazin li dor binpêkirinên mafên mirovan di Îranê de, helwest û daxwaziyên xwe eyan bikin. Bi nêrîna me givaşên civaka navnetewî bo ser rejîma Îranê di pêwendî li gel binpêkirina mafên mirovan di wî welatî de, di rewşekê de ku zêde tekez li ser pirsa navikî tê kirin, pêtir ji caran hewce ye. Ji vê yekê pêtir jî hewce ye ku civaka navnetewî nirxandinek kûrtir di pêwendî li gel biyavên cur bi cur ên binpêkirinên mafên mirovan di Îranê de hebe.

Hewce ye were gotin ku ji ber serkut kirina kesayetî û navendên berevankar ji mafên mirovan di hundirî Îranê û bertengkirina civaka Îranê ji aliyê hikûmetê ve, di wî welatî de eşkerekirina giştî binpêkirinên mafên mirovan bi taybetî di deverên bêpar ên Îranê de ne mumkin e, lewma me bi hewce zanî di wê pêwendiyê de û bi baldan bi qada çalakiyên me li Kurdistanê, binpêkirinên mafên mirovan di çend gotinan de amaje pê bikin.

Çavnihêriya me ji Sekreterê Giştî yê “NY” ew e ku bi baldan bi dijwarbûn û sîstematîktir bûna binpêkirina mafên mirovan di Kurdistanê de, girîngiyek hêja bi wan pêşhateyan bidin.

Bi raya me hesasbûna wê pirsê di vê yekê de ye ku ne tenê jiyana takekesî a mirovan, belkî jiyana çandî û bikom a wan jî di Kurdistanê de bi awayek sîstematîk di metirsiya jinavçûnê de ye û bi baldan bi bayexên hevpar ên civaka cîhanî ku di “carnameya gerdûnî” a saziya dilxwaz a we de hatiye nivîsandin, hewce ye ku navend û kesayetiyên navnetewî di vê derheqê de helwestê bigrin.

Lewma çavbnihêrî tê kirin ku hûn binpêkirinên mafên mirovan ji aliyê rejîmê ve di sefera xwe de li berçav bigrin û di guhê dewleta Îranê de bêjin:

- Nebûna zimanê Kurdî di qutabxane û îdareyan de. Her cure name nivîsandinek fermî bi zimanê Kurdî bê bersiv dimîne û zarokên Kurdan neçar in di 6 saliyê de bi zimanê Farsî biaxivin.

- Hewl û xebatên sîstematîk ji bo guhertina şunasa bajarên Kurdistana Îranê bi taybetî bajarên weke Kirmaşan û Îlamê bi mifahwergirtin ji ragihandinan û perwerdeya dewletî, tepeseriya tund a çalakên çandî ku di pêxema çanda Kurdî di wan bajaran de tê encamdayîn.

- Nedana îzna çalakiyan bi her partî yan yekîtiyek ku bernameya karî a wan pirsa Kurd be. Heya niha girûpên zêde hatine avakirin ku dewleta Îranê îzna wan girûpan red kiriye.

- Îzinnedana Kurdan ji bo mifahsitandin ji navên Kurdî. Kotika Îranê ji tomarkirina navên ku derxerê şunas û nasnameya Kurdî be xwe diparêze, û hûn dikarin kesên zêde li Kurdistanê bibînin ku navên sereke ên wan ji navên nasnameya wan cuda ye.

- Di girtîgehên Îranê de bi sedan girtiyên Kurd bi tometên siyasî weke endametî di partiyên Kurdî de hene ku bi salan e hepsî mane îzna murexesiyê jî ji wan re nahê dayîn û niha jî tu navendek çalak ên mafên mirovan zanyarî li ser rewşa wan ninin. Rejîma Îranê bi gefxwarin ji





malbatên girtiyên siyasî ên Kurd, pêşî ji belavbûna navên wan digre. Hewce ye bihê gotin ku pirraniya girtiyên siyasî ên Kurd derfeta destpêregihîştin bi parêzeran ninin û tenê di çend xulekan de tên dadgehîkirin û bi hukmên dirêjdem tên cezadan. Me çavnihêrî ji we heye ku daxwaz ji desthilatdarên rejîma Îranê bikin ku tevî çavdêriya saziya “NY”, navên gişt girtiyên siyasî eşkere bike û mafên seredana mal û ... bi wan bide û di dadgehek dadperwerane de bihên dadgehîkirin. Zeyneb Celaliyan û Elî Muradî ji wan girtiyan in ku di xirabtirîn rewşa mumkin de dijîn û hukmê dirêjdem yê girtîgehê bi ser wan de hatiye sepandin.

- Mihemedsidîq Kebûdvend tenê bi tometa avakirin û çalakiyên di Saziya Mafên Mirovan a Kurdistanê de 11 sal hukmê hepsê bi ser de hatiye sepandin û ji sala 2007’an ve bi bê îzna seredana mala xwe û bêparbûn ji mafên seretayî di girtîgehê de ye.

- Bi kêmî ve 27 girtiyên din ên Kurd bi tometên siyasî û ewlehiyê di girtîgehên Sine, Urmiye, Simnan, Recayîşehr û Seqizê de çavnihêrên cezaya li sêdaredan, pesendkirin yan hiloşandina hukmê dadgeha pêdeçûnê yan dadgeha bilind a welat in. Ku ji wan em dikarin amaje bi Hebîbulla Letîfî, Şêrko Mearifî, Zanyar Muradî û Luqman Muradî bikin ku tu yek ji wan di dadgehek adilane de nehatine dadgehîkirin û heyamek zêde li jêr îşkenceyan de bûne.

Evana tenê beşek biçûk in ji binpêkirinên mafên mirovan li Kurdistana Îranê de ku girîngiyek taybet hene û ger civaka navnetewî, saziya “NY” û hûnê birêz di sefera xwe de alîkarê netewa Kurd li Kurdistana Îranê nebin, bêguman karesatek di halê qewimînê de ye ku roj bi roj kûrtir dibe.

Hewce ye amaje bi vê xalê jî bihê kirin ku xelkê Îranê û bi taybetî netewa Kurd di Îranê de ji vedîtina riyekê ji bo gîjandina dengê xwe bi civaka cîhanî bi dijwarî hatine bêparkirin û bi hesasiyet û nigeranî ve helwestên we di vê seredanê de binçav dikin.

**Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê**

**Sekreterê Giştî**
**Mistefa Hicrî**
**26’ê Tebaxa 2012’an**

# Spasnameya hevbeş a Hizba Demokrat û Komelê




**PDK Îran û Komeleya Şoreşgêrên Zehmetkêş ên Kurdistana Îranê bi boneya pêşwazî kirin ji rêketinnameya 21’Tebaxê, spasnameyek hevbeş belav kirin.**

Deqa Spasnameyê bi vî awayî ye:

**Spasnameya hevbeş**

Piştî belavbûna rêketinnameya hevbeş a Komeleya Şoreşgêrên Zehmetkêş ên Kurdistana Îranê û Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê li 21’ê Tebaxa 2012’an de, em bûne şahidê komek berbiçav ji peyamên pîrozbahiyê û piştewaniya germ ji vê pêngavê ji aliyê hêzên siyasî, rewşenbîr û çalakên sivîl û herweha navxweyî kurdistanê bi giştî ku arasteyî rêberiya me her du aliyan hatin kirin.

Bi vî awayî û ji riya vê daxuyaniyê ve, Hizba demokrat û Komele, sopasiya hevbeş a xwe bi nîsbet van peyam û dilsojî û hest bi berpirsatî kirina xelkê û aliyên din radigehînin û hêvîxwazîn ku niha şûnde jî bi hev re gavên mezintir bavêjin.

Em xatircem û bawer in ku remza serketina hêzên siyasî ên Kurdistanê û tevgera rizgarîxwazaneya gelê kurd, li yekîtiya wan de ye.

**Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê**

**Komeleya Şoreşgerên Zehmetkeş ên Kurdistana Îranê**

**2’ê Septambera 2012’an**
**12’ê Xermanana 1391 a Rojî**

**Birêz Hicrî di gotubêjek bi Kurdistanê re:**

# Pilatforma han yekrêzî û yek daxwaziya hêza Kurd û yekîtiya wan nîşan dide



## Rêketinnameya han hêviyek nû bi xebat û pêşrojek rohntir dide xelkê Kurdistanê

Midehek berî niha pilatformek hevpar di navbera PDK Îranê û Komeleya Şoreşgêrên Zehmetkêş ên Kurdistana Îranê de hat vajo kirin. Li dor giringiya mijara han, me bi hewce zanî ku gotubêjekê li vê derheqê de bi birêz Mistefa Hicrî, Sekreterê Giştî yê PDK Îranê re pêk bînin.

**Çend sale bas ji vê yekê tê kirin ku hûn hewil didin di gel aliyên din ên rojhilata kurdistanê bereyek hevpar pêk bînin yan jî pilatformek hevpar vajo bikin. Heyamek berî niha di navbera PDK Îranê û Komelê de pilatformek hat vajo kirin. Hûn girîngî û hewcehiya vê rêketinê bo çi vedigerînin?**

Hewlên PDK Îranê bo pêkanîna yekrêzî û xebata hevpar bi dijî Komara Îslamî li navbera hêzên opozîsyona Îranî û nemazê hêzên opozîsyona Kurd de vedigire bo salên despêka hatine serkara Komara Îslamî. Hewcehiya vê rêketinê ji vê yekê çavkaniyê digre ku:

Yekem: Serkut û tepeserkirina yek li dû yek ên hêzên neyare Komara Îslamî bo vê rejîmê bi hêsanî tê encam dayîn, lê hekî hemû bi hevre xebat û rikeberiyê bidomînin, rêjîm nikare wan serkut bike û li qada xebatê derbixîne.

Duyem: PDK Îranê li ser vê baweriyê bûye ku hevdem di gel ciyawaziyên di navbera hêzên neyar ên Komara Îslamî de, xalên hevpar ên zaf jî di navbera wan de hene ku dikarin li ser bingeha wan xalên hevpar, yekrêzî û yekîtiyê pêk bînin û li ser ciyawaziyan jî gotubêjan bikin û guh bidin hevdu heya ku xalên ciyawaz kêmtir bikin.

Di vê derheqê de PDK Îranê di destpêkê de heya niha weke heyeta Nûneratiya Gelê Kurd, Şêvra Netewî a Bergiriyê û niha jî di Kongireya Netewên Îrana Federal de di hevpeymaniyê de ye û rolek girîng li avakirina vê hevalbeniyê de lîstî ye.

Tenanet hewla hevpeymaniya di navbera PDK Îran û Komelê de jî vedigere bo dehsalên 80' ê rojî, lê wî çaxî bi sedema hin hokaran hevpeymanî bi encam negihîşt. Piştî Kongireya 13 ya partiyê û li gor rasipardeyên kongirê, car din me dest avêt got û bêjan di gel hejmarek zaf ji rêxistinên Kurdî, lê mixabin bi sedema hebûna Komek arîşeyan me nekarî bigehin tu encamekê, lê kosp û arîşeyên han em ji hewlên xwe xemsar nekirin. Eva bû ku salek berî niha dema ku guhertinên deverê û rewşa siyasî û abûriya Îranê xirabtir bû, hewcehiya pêkanîna pilatformek hevpar di navbera ev du hêzan de berçavtir û bileztr bû, lewma di vê demê de li dor hindek mijar û karên hevpar ên biçûk de me dest avêt gotûbêjan û bi xweşî ve bi awayek baş pêş ketin û di encama de, rêkevtinnameya han di navbera her du aliyan de hat vajo kirin û ragehandin. Ji niha pêve di çarçoveya pilatforma han de emê hevkariya hevdu bikin.

**Gelo di gel partî û aliyên din ên Kurdistanî jî, li dor tevlîbûna bi pilatforma han pêwendî hatiye girtin?**

Heya niha peywendî nehatiye girtin, belkî tenê pilatform hatiye ragehandin û hemû alî û xelkê Kurdistanê ji kakil û naveroka wê hatine haydarkirin û peywendî girtin bi aliyên dine re dimîne bo niha şûnde.

**Di pilatformê de bas ji hevkarî li warên ragehandin, dîplomasî û ...htd de hatiye kirin. Dikarin hinekê zêdetir vê yekê bo me şirove bikin?**

Hekî bixwazim bi kurtî bersiva pirsyara we bidim, hewce ye bêjim ku Komele û PDK Îranê li ser hejmarek xalên hevbeş wek şikl û qewareya hikûmeta Îranê piştî nemana Komara Îslamî, mafê netewî yên gelê Kurd û netewên din ên Îranê, pirensipên navnetewî weke parastina mafên mirovî, azadî di hemû biyavan de û herweha selmandina vê rastiyê ku demokrasî û hemû mafên han bi hebûna rejîma Komara Îslamî nahên cî bi cî kirin, lewma bi eşkere di daxuyaniyê de hatiye ku rejîm dibe jinav biçe, her du alî xwedî nêrînek wekhev in û li gor daxuyaniya hevpar biryar hatiye dan ku nêrînên xwe ên weke hev, veguhezin nav kor û komelên navnetewî, partiyên siyasî ên rojavayî û Îranî.

Ev xalên han bi taybetî di îro rojê de li vî warî de girîng in ku hêzên biyanî û hêzên opozisyona Îranî ku em herdu alî li gel wan di peywendî û got û bêjan de ne, di cihê bihîstina boçûnên ciyawaz û hindek caran nateba û dûr ji hev ên hêzên Kurdî de, daxwaz û helwestên wekhev dibihîzin. Eva yekrêzî û yekdaxwaziya hêza Kurd û yekîtiya wan nîşan dide û pêtir guh didin daxwazên wan.

**Hûn bandora rêketinnameya han li ser pêşeroja Rojilata Kurdistanê çawa dinirxînin?**

Bi liberçav girtina vê rastiyê ku her yek ji PDK Îranê û Komelê dîroka xebata taybet bi xwe hene û di Kurdistana Rojhelatê de naskirî ne, rêkevtina di navbera wan de digel pêşwaziya bê wêneya xelkê Kurd bi giştî û xelkê Kurdistana Îranê bi taybetî berbirû bû, lewma li ser vê baweriyê me ku hêviyek nû bi xebat û pêşerojek rohntir dide xelkê Kurdistanê. Xelkek ku bi sedema veqetiyan û perçebûna partiyên Kurdî li Kurdistan Îranê di çend salên derbasbûyî de, di gel bêhêvîtiyê berbirû bibûn, lê bi vê hevalbendiyê cardin geş û dilxweş bûn û hest dikin ku pêvajoya veqetiyan û parçebûnan bi dawî bûye û cardin, yekrêzî û hevxebatî ku hewcehiya karê me yê siyasî di îro rojê de ye, dest pê kiriye.

# Behrînê ji Îranê xwast ku daxwaza lêborînê seba "çewaşekirina" axaftina Mursî bike

**Wezareta Derve a Behrînê, Kardarê Balyozxaneya rejîma Îranê gazî kir û seba "çewaşekirina" axaftinên Serkomarê Misrê û anîna navê "Behrînê" li cihê "Sûriyê" ji aliyê wergêr ve, nerazîtî nîşan da, û ji rejîma Îranê xwast ku daxwaza lêborînê bike.**

Li gor rapora malpera "Radiofarda", Wezareta Derve a Behrînê di daxuyaniyekê de ku "Ehmed Elezîz Amir" birêveberê giştî yê karûbarên deverê û şêvra alîkariyê yê Wezareta Derve a Behrînê, bi gazîkirina Kardarê Balyozxaneya rejîma Îranê li "Mename", nerazîtiya welatê xwe seba "Çewaşekirina" axaftina Mihemed Mursî Serkomarê Misrê ji aliyê wergêrê telefîzyonî yê rejîmê ve ku li cihê "Sûriyê" navê "Behrîn" ê anîbû, bi wî ragihand û ji rejîma Îranê xwast ku daxwaza lêborînê bike.Nerazîtiya han seba guhertina axaftina Mihemed Mursî ji aliyê wergêrê rejîma Îranê ve di civîna welatên bêalî li Tehranê de bûye.

Welatê Behrînê ji rejîma Îranê xwastiye ku daxwaza lêborînê bike û kiryarên hewce di wê derheqê de bigre pêş, çimku riftara han zirar li "pêwendiyên dostane û birayane" ên navbera Behrîn û Misrê daye.

Di beşek din a axaftina Mihemed Mursî de ku gotibû: Vêtokirina biryarnameya Şêvra Ewlehiyê a "NY" di warê Sûriyê de ji aliyê Rûsiye û Çînê ve, destên Şêvra Ewlehiyê ji bo rohnkirin û çareseriya pirsa Sûriyê kurt kir", wergêrê televîzyona rejîma Îranê bi vî awayî wergeran kir û got: Vêtoyê destên Şêvra Ewlehiyê ji bo rohnkirin û çareseriya kirîza guhertinên xelkî kurt kir".

Di doma axaftina xwe de dema ku Mursî got: "Em bi xelkê Sûriyê re li dijî nîzama zulm û tepeserkar piştevaniya xwe nîşan didin", wergêr got: "Em hêviya mana nîzama Sûriyê bi hebûna piştevaniya xelkê dixwazin".

"Mihemed Şoman" Mamostayê Pêwendiyên Zanîngeha Misr û Elcezîre gotiye: "Eva şaşî nebû, belkî riswayiyek ragihandinî, exlaqî û siyasî bû. Bûyera han, nîşanderê riftara bernamedarêtî ji bo berxarkirina têgihîştin û raya giştî di hundirî Îranê de ye".



# Asîmîlasyona nejadî li Kurdistana Îranê



Ferşîd Neqşefken

Asîmîlasyon an bişaftin, li proje û hewlidanek tundûtûj ji bo yekdestkirina herêmekê re di warê nejadî de tê gotin ku pirr car bi awayê dûrxistin, koçberî, cihgirkirina neçarî û komkujî û qirkirinê tê meşandin. Asîmîlasyona nejadî gellekî caran bi jinavçûna beşek ji berhemên dîrokî, goristan, avahî û sembolên şaristaniya wan neteweyan dike armanca xwe.

Asîmîlasyon metodek ji proseya kuştina nifşan e ku bêhtir bo jiholêrakirina gelê armancgirtî li herêmek cografî ya taybet tê encamdan û pirr car dibe sedema guhertina demografiya nejadî, neteweyî û olî ya wê deverê. Em dikarin bêjin ku nifşkujî û asîmîlasyona nejadî di rewşekê de herî zêde dişibin hev ku ew jî tunekirina neçarî ya grûpên nejadî, neteweyî, olî û îdeolojîkî ye.

Vir de emê ji bo zelalbûna asîmîlasyona nejadî ya desthilatdarên li Îranê derheq kurdan çend nimûneyan raxin ber çavan:

Koçbarkirina bi neçarî û dûrxistina hozên kurd ku li deverên rojavayê gola Urmiyê jiyan dikirin, bo sînorê Xorasanê û herêmên derdor ku wek nimûneyek destpêkî ya asîmîlasyona nejadî di pêvajoya dîroka Kurdistanê de li dijî Kurdan bê zanîn. Ji ber ku ew koça neçarî û zordarî ya kurdan bo deverên din ên Îranê bû sedem ku di pêvajoya sedan salan ji vê tevgerê, pirr sembolên neteweyî di nav wan de lawaz û kêmreng bibin. Bo mînak hoza Topkanlo yek ji wan malbatên mezin bûye ku ji ber jiyankirin li kêleka cîranên tirk û turkeman di çend sed salên borî xalên çandî û kultûrî di hundirê wan de lawaz bûye. Lê ligel vê yekê û hemû hewildanan bo jinavbirina nasname û ziman û çanda Kurdî di nav wan kurdên koçberkirî de, lê niha jî hesta neteweyî di nav kurdên Xorasanê de xurt bûye û berxwedana kurdên Xorasanê bêhempa bûye heta niha. Lê ev prose wek asîmîlasyona nejadî tê zanîn.

Komkujî û qirkirina xelkê sivîl û bêguneh li gundên Qarne û Qelatan û dehan komkujî û cinayetên mezin li gundên din ên Rojhilatê Kurdistanê, yek ji awayên herî tundûtûj û mezin ên nifşkujî û bişaftina dijî neteweyî bû ku di van salên dawî de Komara Îslamî ya Îranê li dijî gelê kurd meşand.

Roja 2`ê Îlona 1979`an, nêzîk demjimêr 13`ê nîvro, dema zarokên kurd li pêşberî malên xwe dilîstin, jin mijûlê karûbarên nav malan bûn û hejmarek ji ciwan û mêr li derdora gund karê cotkaarî û ajeldariyl dikirin, kirêgirtiyên rejîma Îranê bi tank, top û sîlehên sivik û giran, êrîş kirin ser gundê Qarne li bajarê Nexede. Rojnameya `Itilaat` a çapa Îranê roja 07.12.1979`an raporek li ser vê cinayetê belav kir û eşkere kir ku hêzên dewletên bi tank, top û çekên giran operasyona haan kirine.

Wê demê 80 malbatan ji gundê Qarnê jiyan dikirin, lê rojnameyên dewletê tenê hejmara qurbaniyên wê cinayet û komkujiyê 68 kes ragehandibûn! Hemû belge û şahidên bicihmayî ji vê bûyerê derdixin holê ku ev komkujiya siyasî ku ji aliyê hêzên dewletê ve hat rêvebirin, projeyek bû ku bi aramnca bişaftin û jiholêrakirina grûpek etnîkî ya diyarkirî hatibû darêtin û bi kiryar û piştevaniya rayedarên naskirî yên dewleta Îranê hat meşandin.

Hêj çend meh ji şoreşa gelên Îranê derbas nebûbû ku li herêma Soma û Biradost a Urmiyê, zext û siyaseta kurdkujiyê gihîşte astekê ku zêdeyî 30 gundên vê deverê hatin valakirin û çend gund jî Gêçê û Heleqoş hatin wêrankirin. Gundî hatin neçarkirin ku koç bikin û wek hewlek bo nifşkujiya neteweyî tê hesibandin.

Li Kurdistanê pirr kesayetî û aliyan dixwestin bi rêyên aştîxwazane pêşiya liv û tevgerên hovane û cinayetkarane ên hikûmeta navendî bigirin, lê mixabin hemû ked û cehdên mirovî yên wan kesan bêencam man.

Kurd tenê bi sedema nasnameya wan a netewî tên neçarkirin ku xaka bav û kalên xwe bicîh bihêlin ku diçe çarçoveya asîmîlasyona nejadî û neteweyî, ji ber ku bi neçarî tên ferzkirin û berevajî xwesteka komek mirovan ev kar tê kirin.

Li gor Carnameya Gerdûnî ya Mafê Mirovan a RNY ku di sala 1948`an de hate pejirandin, her core kiryarek bi armanca tunekirina grûpek nejadî, netewî, olî wek komkujiya grûpek taybet, pêkanîna xesarên pîskolojîk û cesteyî li ser grûpek taybet û derbelêdan bi wan kesan û ferzkirina hinek kiryarên berevajî viyan û xwesteka grûpek ji mirovan, faktên eşkere ên nifşkujî û bişaftinê tên hesibandin.

Li Îranê ji xeynî nifşkujî û tunekirina grûpek siyasî ku jê re siyasîkujî (Politicide) tê gotin, kuştin û şehîdkirina çendîn rêber û kesayetiyên mezin ên kurd ku dixwestin bi diyalog û gotûbêj û rêbazên aştîxwazane ava demokrasiyê li civaka Îranê zelal bikin û serweriay neteweyî ji gelê xwe re bidest bînin, pirr hovane hatin şehîdkirin. Simkoyê Şikak, Pêşewa Qazî Mihemed,

Dr. Qasimlo û Dr. Şerefkendî çend nimûneyên berçav in ji wan kesayetiyên kurd di dîroka hemdem a Kurdistanê de ku bûn goriyê siyaseta tunekirina viyan û îradeya bihevre jiyana aştiyane û civakeke demokrat û dûr ji tûndûtûjî û asîmîlasyonê ji alityê desthilatdarên xedar.

Pêdivî ye ku civaka cîhanî û raya giştî li hemberî asîmîlasyon û nifşkujiya li dijî Kurdan li Îran û welatên din bêdeng nemînin.



# Niqurçk



## Xelo = Celo! Sûriye = Behrîn!!!



Ceifer Mubeşirniya

Bila bên

Aha aha aha, çepik çepik çepik, çêke çêke çêke, sssssssss…

Mirovê bê eqil wusan difire ku her ew dema heyî biser de derbas be êdî paşan ne xem e.

Rejîma Îranê di çend rojên derbasbûyî de gomexelek ji welatên bêalî re girt û bi awayek taybet ji beşdariya Serokkomarê Misrê "Mihemed Mursî" pirr hez kir.

Wan jêve bû ku çûnku navmilpan û patikstûr e wê bibe gayê cotî û wê mînanî Fîrozabadî Îsraîlê pê bikêle.

Mursî jî ku nûnerê welatek mezin yê mîna Misrê ye, axaftina xwe kir, helbet axaftinek aqilane û mirovhezane kir. Axaftinek ku ne bi dilê rejîma Îranê bû, lewma jî gotinên wî yên bi Erebî ji riya qirêjxurek xwe ve bi berevaj û xeletî wergerandin ser farsî.

Vêca were tu ji dewletek weha bifikire ku ne xelkê Îranê Erebî dizane, ne jî xelkê Ereb di gişt cîhanê de Farsî dizane. Mehmûd jî guhên xwe şor kiribûn û qirêjxurê wî çi jêre tercume dikir wî dikişand eqilê xwe yê bi qasî nîskê.

Mursiyê feqîr got: Vêtokirina birryarnameya Şêvra Ewlehî a "NY" derheq Sûriyê de, ji aliyê Rûsiye û Çînê ve, destên Şêvra Ewlehiyê, ji bo rohnkirin û çareseriya pirsa Sûriyê kurt kir".

Roj ronî ye û xelik hişyar.

Lê wî wergêrê neqence kurê neqencî, li dobleya xwe de weha da zanîn: "Vêtoyê, destên Şêvra Ewlehiyê ji bo rohnkirin û çareseriya kirîzê û guhertinên xelkî kurt kir"!!!

Di beşek din a axaftina xwe de Mihemed Mursî got: "Em piştevaniya xwe ji xelkê Sûriyê re li hember nîzama zulm û tepeserkar nîşan didin".

Wergêr li wê derê jî got: "Em hêviya mayîna nîzama Sûriyê bi hebûna piştevaniya xelkê dixwazin".

Lê ji herduyan xweştemaşetir ew bû ku wergêrê rejîmê li cihê anîna welatê "Sûriyê" navê welatê "Behrîn"ê anî. Berî her tiştî Mihemed Mursî her navê Behrînê neanî. Ya din jî xwe ger hemû axaftinek bi çend zimanan jî bihê wergerandin, nav her nav e. Ew jî navên navnetewî ên du welatan.

Wella dibe ku navê "Xelo" û "Celo" ber mirov bezir be, lê wallah û bîllah "Sûriye" û "Behrîn" erd û esman lê dûr in.

Lê ji Mehmûdê rimûzad re girîng bû ku çi ji wergêrê xwe dibihîze, vêca cîhan çi dibêje bila bibêje.

Civîn qediya û Salihî dest bi çepikan kir û Mehmûd Ehmedînijad jî rabû semayê.

Vêca piştî çend demjimêran dinyayê rejîma Îranê kire domastek û danî pêşiya se.

Serê rejîmê çiqas şorr bû, îca şorrtir jî bû her maye zarok tilikan bidin desthilatdarên rejîmê.

# Karesatek bi navê giraniyê



Şehab Xalidî

Serbarê vê ku îro rojê baskirina ji giranî, tewerom (helawsan), bêkarî û xisarên civakî bûne mijarek asayî, lê berpirsyarên paye bilind ên rejîmê radigehînin ku xelk ji rewşa heyî razî ne, û dewlet jî bi xelkê re ye, û heke arîşeyek hebe wê hewlê bidin ku zû çareser bikin.

Ew îdiayên berpirsyarên rejîma Îranê di dmekê de ne ku hinek hokaran li doma pêvajoyekê de, dest dane destê yektir û encama wê jî pêkhatina vê rewşa pirr ji kirîz e ku em dibînin. Siyasetên dewletê, û sîstema banka nawendî sedema bingehîn ya vê pêvajoyê ne, lê kerta taybet di vê pêvajoyê de bê bandor nine, herweha hinek hewil didin ku tewaya kêşeyan vegerînne ser pirsa tehrîman, lê divêt em bêjin ku kêşe û arîşe zêdetir ji vê hindê ye.

Para beşa dewletî û şibhi dewletî di aboriya welat de %70 e, çavkaniya bingehîn ya malî bo vê aboriyê jî dahata çavkanîgirtî ji hinartina neftê ye. Diravê zêde û bêqas yê neftê ku di destê dewletê de ye, û kêmiya berhemanîna kalayan sedemek din ya giraniyê di Îranê de ye.

Herweha ew giranî dikare encama tehrîman jî be. Zexta li ser bankan, daketina buhayê diravê Îranê û jêhelçûna nirxa dolar bi awayeke berbiçav, û kêmiya kalayan nîşaneya bi bandorbûna tehrîman e ku dewlet bi çavê xwe dibîne. Dewlet gellek hewil dide ku weha nîşan bide ku tehrîm bê encam in, û eva şerê rewanî ê rojawayiyan e, lê tenê rawestana xelkekî zaf li goviya kirîna mirîşkan de, bi başî radeya giraniya karesatbar û encama tehrîman diselimîne. Rejîm ji tirsê serhildana xelkê nerazî dixwaze weha nîşan bide ku di welat de ewlehiyek tewaw heye û giranî jî wê zû bê çareserkirin û ew giranî ne encama tehrîman e.

Lê li gorî raporên fermî ên navnetewî ji destpêka qedexekirina kirîn û veguhastina nefta Îranê bo welatên Ewropayî pêde, dewletê rojane nêzî 133 milyon dolarî xisar dîtiye. Herweha li encama wan tehrîman de hinardeya nefta Îranê heya %50, wate rojane 1.2 milyon bermîl kêm bûye, û tê texmînkirin heke ew rewş heya salekê berdewam bike, Îran wê 48 milyard dolarî xisarê bibîne. Hinek ji karnasan li ser vê bawerê ne ku encama tehrîmên aborî li ser Îranê kêmtir ji êrîşa leşkerî bo ser wî welatî nine.



Lê gellek şarezayên pirsên siyasî li ser vê bawerê ne ku ew giranî û bêkarî û hejariya xelkê, bê guman wê serhildanek giştî bi dû xwe re wê hebe. Jiberku vê carê tenê serhildan ji bo demokrasiyê nabe, belku vê beşek zaf ji civakê ku niha hejar in, û ji destê bêkarî, hejarî û bê dadiyê de dinalînin, wê têde beşdariyê bikin.

Renge li serhildana sala 1388'an de beşek ji xelkê hebûn ku digotin heke azadî û demokrasî jî tunebe, lê rewşa aboriya me baş be, em tevlî serhildanan nabin, lê niha êdî giraniyê pişt ji xelkê çemandiye û ew neçarb in ku tevlî serhildanên îhtimalî bi awayek ektîv bin. Ji aliyek din ve wê demê diruşma "ka dengê me?" zortir li ser zar û zimanan bû, lê niha bê guman diruşm wê pêkhateşikên bin. Ji aliyek din ve şoreşa li welatên Erebî û bi taybetî li Sûriyê de niha êdî morala xelkê û baweriya wan bi xwe çend hember zêde kiriye, û ji aliyek din ve zext û guşarên navnetewî bo ser hikumeta Îslamiya Îranê gellek zêdetir ji sî salên berê ye.

Bi awayek giştî serjimêriyên heyî diselimînin ku rewşa aboriya welat li encama tehrîman de ber bi xirapiyê ve çûye, û pêkhateya diravî-malî ya welat û tewaya jêrxanên aboriya welat di gel gefên jinavçûnê berbirû ne, û karbidestên rejîma Îranê jî emrazên hewce bona çareseriya vê rewşê di destê xwe de çinînin.

Çavkanî:
Gotara; Giranî û helawsan ji nivîsîna Behram Rehmanî
Gotûbêja di gel Cemşîd Esedî
Gotûbêja di gel Mêhrdad Derwîşpûr
Gotûbêja di gel Dr. Ehmed Elewî

# Pêvajoyek bijan bo rejîmê

KewêZer

Pêvajoya destpêkirirî di "Rojhilata Navîn" de, bi tu awayekê bi dilê rejîma Îranê nine û her ku diçe Komara Îslamî pêtir ji pêlên nerazîbûna xelkê azadîxwaz yên cîhana Ereban ditirse.

Renge hin ji wan rejîmên ku ketine ber pêlên "Buhara Erebî" û hiloşiyane, rikeber yan jî heta astekê dijber û gefek bûn li dijî rejîma Îranê û îro nemane. Lê ya ku pêtir rejîma Îranê azar dide, ev e ku alternatîvên wan rejîmên dîktator li Misr û Lîbiyê de, ne di berjewendiya Komara Îslamî de dimeşin. Ku waye şoreşên giştî welatên Erebî cuda ji vê çendê ku tirsek xistiye nav dilê Komara Îslamî, pêtir ji encama wan şoreşan ditirse.

Bo mînak, heya niha jî ku hikûmetek îslamî di Misrê de desthilatdar e û di dema hilbijartinên Serokkomariya Misrê de rejîma Îranê piştgirî û propagende ji bo berbijêrê "Ixwanan" dikir, lê pêwendiyên ku di dema rejîma "Husnî mubarek" de li gel Îranê tevlîhev bibûn, normal nebûne. Eva di demekê de ye ku heya niha bo cara sêyem e rejîma Îranê di asta Serokkomariyê de "Mihemed Mursî" Serokkomarê îslamî yê Misrê dawetî Îranê kiriye, lê bêbersiv maye. Ji berku cîhana îro û qonaxa nû di qada siyasetê de bi tu awayekê berjewendiyên hundirê xwe nake goriyê îdeolojiyê. Mîna beşdarî nekirina Lubnanê di civîna ku rejîma Îranê ji parastina rejîma Esed re pêk anîbû, yan jî daxuyaniya Hemas a Felestînê di egera êrîşa Îsraîlê bo ser Îranê ku ragihandibû: "Em tenê berevaniyê ji berjewendiyên xwe di axa xwe de dikin", gişt hewlên rejîma Îranê ji bo guhertina arasteya desthilatên nû di cîhana Erebî de wê bibin bulqên ser avê.

Lê ger bi awayek taybetî pirsa Sûriyê di nava Buhara Erebî de were şirovekirin, di gişt wan şoreşên welatên Erebî de, rejîma Îranê bi qasî hiloşîna rejîma Beşar Esed hest bi tirs û janan nekiriye û jêre weke kabûsekê lê hatiye. Ji berku him hevalbendê stratejîk û herî bihêz û nêzîke Komara Îslamî di Rohjilata Navîn de jinav diçe, him jî bedîl û cihgirê rejîma Esed, dê yek ji dijberê sereke yê rejîma Îranê be û dûr nine di hizra tolhildanê ji rejîma Îranê di pêwendî li gel alîkarî û piştevaniya berdewam ji rejîma Esed bi tabyetî di kuştina xelkê bêtawan û dijberê Esed de be jî.

Rejîma Îranê di rûyekî de dibêje ku hiloşîna rejîma Sûriyê nemumkin e, lê encama hewlên rejîma Îranê tiştek din li jêr kewilê Komara Îslmaî derdixe ku rejîma Îranê bixwe jî ji hikûmeta "Beşar Esed" bêhêvî bûye. Gerra vê dawiyê a "Seîd Celîlî" şandiyê taybet yê "Xamneyî" ji bo welatên Rojhilata Navîn, nîşan dide ku rejîma Îranê tevî hemû hewlekê ji bo parastina rejîma Esed,

armanca sereke peydakirina hevalbendan di welatên ku di halê jinav çûnê de ne ye. Ku dûr nine piştî nemana Beşar Esed di desthilatê de, rejîma Îranê bi piştevanî ji girûpên tundajo di Sûriyê de bi taybetî mifah standin ji herêma "Elewiyan" bi serokatiya Beşar Esed çeperek qahîmtir ji bo ragirtina şerr li dervey sînorên xwe ava bike.

Ger "Xezzeyek" din jî li devera Elewiyên Sûriyê ji rejîma Îranê re ava bibe, mileke wê rejîmê di axa Sûriyê de diparêze û Komara Îslamî digîjîne armancek mezin di vê bêhîvîtiya ku ji rewşa Sûriyê jêre derketiye.

Pêka vê şiroveyê, rejîma Îranê bûna xwe di Sûriyê de diparêze, lê dawîn hevpeymanê xwe yê desthilatdar di Rojhilata Navîn de jidest dide. Raste ku girûpên din ên weke Hizbullaha Lubnanê û hûrdegirûpên din ên terorîstî li jêr siya rejîma Îranê de sax in, lê nikarin mîna hevpeymanên bibandor bi taybetî di qada abûrî de ji Komara Îslmaî re bin.

Îro nahê xuyakirin ku tu welatek û tu desthilatek di Rojhilata Navîn de bersiva Komara Îslmaî ji bo hevpeymaniyê bide, lewma ger bikewe hesabek din, rejîma Îranê hevpeymaniya welatek weke "Misr"ê bi Serokatiya Ixwanan li serwey gişt girûpên din ên girêdayî bi xwe ve didanê, lê heya niha welatê Misrê û heta Lîbî jî ku rikeberên sereke ên rejîma Îranê têde hatine hiloşandin, tu hezek ji bo pêwendî ligel rejîma Îranê nîşan nedane.



# Tometên nerewa, îfadeyên bi zorî û îdam

**Hêmin Kurdî**

Girtîgeha navendî ya Urmiyê ku zêdeyî 100 salan e hatiye avakirin û cihê hezar û 500 kesî dike, lê di rewşa niha de nêzîk 3 hezar kes têde hatine vepestin. Di hundirê girtîxaneyê de dehan beşên cor bi cor hene ku di her yek ji wan de girtiyên bi sûç û tawanên cuda tên ragirtin. Ev girtîgeh li ser rêya cadeya gola Urmiyê hilketiye û di salên dawî de sedan girtî û nemaze yên kurd têde hatin darvekirin.

Piştî ku rejîma Îslamî li Îranê hate ser desthilatê û bi taybet di dewrana desthilatdariya Ehmedînejad de, zext û zordarî li ser gelê kurd çend qat zêde bûn û bi hêcet û taktîkên cuda dest bi darvekirina berdewam a hevwelatiyên kurd kirin ku zêde dişibe nifşkujî li dijî gelê kurd.

Her rojên sêşem, hejmarek berçav ji malbatên kurd li pêşberî girtîgehê kom dibin û li benda hevdîtin û axavtin ligel kes û karên xwe yên girtî bi rêz disekinin. Pirr caran jî piştî çend demjimêr çavnihêriyan, ligel bersiva NA ya berpirsyarên girtîgehê rûbirû dibin û nikarin ligel girtiyan bipeyvin yan hevdîtinê pêk bînin.

Di vê dawiyê de, hin car li girtîgeha Urmiyê girtî bi kom hatine darvekin. Îsal 2 gurûpên 6 û 8 kesî jî girtiyên kurd di yek rojê de hatin îdamkirin. Di nav wan darvekiriyan de gellek ciwanên kurd tên dîtin ku sê ji wan tenê endamên malbatekê bûn.

Emê vir serpêhatî û çawaniya girtin û darvekina 3 ciwan ji endamên malbatek kurd ên gundê ''Kefsî'' ya Urmiyê bikin. Di havîna sala 1386`a Rojî de, hêzên Wezareta Ewlekariyê êrîş kirin ser malbata hewelatiyê kurd Sidîq Abidînî û 3 kes ji endamên wê malbatê bi navên Çengîz Abidînî û Selah Aidînî ligel zavê wan Faris Şahînî bi tawana veguhastina madeyên bêhişker girtin û birin Îdareya Ewlekariyê. Piştî xwedîkirina wan sê kesan di îşkencegehên Wezareta Ewlekariyê de û îfadewergirtina bi zorê û dûr ji rastiyê, ew birin girtîxaneya navendî ya Urmiyê û demek kurt nekişand ku Dezgeha Dadê li Tehranê biryara darvekirinê ji wan 3 kesan re birrî. Malbata wan ji bo hilweşandina biryarê doz vekirin û bi awayekî fermî nerazîbûn nîşan dan, lê hewildana wan heta dema darvekirina wan jî bêencam bûn.

Di dema ku ew di girtîxaneyê de dihatin ragirtin, Faris karîbû bi nobedarekî girtîgehê re biaxive û çîroka girtin û bêtwaniya xwe bîne berbas. Faris gotibû ku nîvroya roja hatibûn girtin, diçe serdana malbata xwe li gundê Kefsî û nîva şevê hêzên ewlkariyê diçin hundirê mala wan û wî ligel Çengîz û Selah digrin. Wî gotibû ku haya wan ji tu tiştî nebûye û me karek wusa nekiribû. Lê dema em bi çavgirtî birin Wezareta Ewlekariyê, ewqas bi awayekî giran û hov îşkence kiribûn û bi zorê neçar kirin ku bi derew îtirafê bikin û me wek tawanbar bidin naskirin. Faris ji wî noberdarê girtîgehê re gotibû, ger wan bi derew îfade nedabana, wê di bin îşknceyên dijwar de canê xwe ji dest bidana. Wî diyar kiribû ku îşkeneyên li ser wan ewqas dijwar bûne ku herdem hêviya mirinê xwestibûn û tenê ji ber ku ji wan îşkenceyan bifilitin, bi neçrî îtiraf kiribûn.

Di zistana 1389`ê de, biryara davekirina Faris Şahînî bêy agahdarî mlbata wî û parêzerê wî birêve çû û hat îdam kirin û xewn û hesreta dîtina malbatê û 4 zarokên xwe bire bin xakê. Niha hevser û zarokên Faris rojên dijwar ên bê bavî û bê serperestiyê diqedînin. Piştî nerazîbûna malbata Faris li hemberî vê awayê darvekirinê, îzin hat dayîn ku berî darvekirina Çengîz û Selah, ew dikarin bi malbatên xwe re hevdîtinê pêk bînin. Piştre Çengîzê û birayê wî Selah hatin darvekirin. Çengîz dema ligel hevser û zarokên xwe re hevdîtin kiribû, ji hevsera xwe re gotibû ew di bin



îşkenceyên dijwar de hatin neçar kirin ku îfadeyan nerast bidin. Ew diyar dike ku bê tawan bûye, lê ji hevsera xwe ya ciwan re dixwaze jiyana xwe berdewam bike û keça xwe jî radestî diya wî bike.

Gotinên demên dawîn ên jiyana Çengîz xemek giran dixe nav dilê hevser û malbata wî ku çawa dibe xortekî kurd wiha bêtawan bê kuştin. Çengîz jî sibeya roja 7`ê Rêbendana 1389`ê Rojî li girtîgeha Urmiyê hat darvekirin. Di dema veşartina Çengîz de pevçûn di navbera malbat û kes û karên wî û hêzên ewlekariyê de derdikeve holê.

Piştî îdamkirina Çengîz, Selah dema nûçeyê darvekirina birê xwe dibihîze, rastî pirsgirkên piskolojî dibe û li nexweşxaneya girtîgehê tê ragirtin. Di 03.08.1390`ê Rojî de, biryara darvekirina Selah jî birêve çû û ji ber reaksiyonên berê ên malbata wan, berpirsyaran rê nedan Selah bi dezgirtî û malbata xwe re hevdîtinê pêk bîne.

Di heyamê 9 mehan de, her 3 kes ji malbata Abidînî hatin darvekirin. Rejîma Komara Îslamî bi îdamkirina wan 3 hevwelatiyên kurd, çirayê roniya malbata wan vemirand û tazî û xem û kovan xiste dilê wan ku qet nayê jibîrkirin. Eva tenê nimûneya malbatek kurd e li Urmiyê û herêmên derdor ku mînakên wek wan pirr zêde ne û di salê de sedan kurd bi vî awayî jiyana wan tê standin.

# Rejîma Îranê bilavkerê madên hişber

**Rûken**

Saziya Çavdêr a Mafê Mirovan û Saziya Navneteweyî ya kêmkirina xesaran, ragehandiye ku binyat û nawendên ser bi NY, divêt alîkariyên malî ên xwe li gel Îranê li pêwendî tevî madeyên hişber bidawî bînin.

Bi raya wan du rêkxirawan sîstema hiquqî û dadweriya Îranê, mafê tometbaran di warê destpêragihîtin bi parêzer û dadgehîkirina dadperwerane binpê dike û li encam de dibe sedema bidarvekirina hijmarek zêde a tometbaran, ku ew yek jî binpêkirina bi eşkere ya mafên destpêkî ên girtiyan e.

Lewra rêkxirawên pêwendîdar heya wê demê ku ji dawîanîn bi binpêkirina mafê girtiyan û hilgirtina hukmê bidarvekirina wan ji aliyê rejîma Îranê ve xatircem nebin, nabe alîkariya malî di gel rejîma Îranê bikin.


ISNA/PHOTO: AMIN KHOSROSHAHI

Yasaya xebata bi dijî madeyên hişber ji bo ragirtin û hilgirtina her pênc kîloyên Tiryakê, û sî girem Hîroyîn û Morfînê, cezayê bidarvekirinê diyarî kiriye, û tometbar li pişt deriyên daxistî û di demekê de ku tu mafeke bergirîkirina azadane ji xwe tuninin, û heta di demekê de ku cezayê bidarvekirinê jî bi ser wan de tê sepandin, mafê daxwaza pêdaçûna bi ser hukmê sepandî jî pişt guh ve tê avêtin.

Hijmara yên ku ji aliyê rejîma Îranê bi tometa maddeyên hişber hatine bidarvekirin, di wan salên dawî de berev zêdebûnê çûye.
Li gorî rapora rêkxirawa lêborîna navnetewî li sala 2009, %43 ji bidarvekiriyan û di sala 2010'an de %68 ji bidarvekiriyan li ser qaçaxa madeyên hişber bûne.

Di rastî de alîkariya malî ji aliyê "Nivîsîngeha dijayetî di gel madeyên hişber a ser bi NY" ve, di gel rejîmeke wek rejîma Îranê ku bixwe hokarê bilavbûna madeyên hişber e, derbê li hitbar û piristîja vê saziya cîhanî dide, û wê demê ew jî divêt wek hokarê zêdebûna hijmara bidarvekiriyan bên hesibandin.

Jiber ku tenê di navbera salên 2000 ta 2009'an, ji aliyê welatên ser bi YE ve nêzîk bi pênc milyon dolarê Amerîkayî, alîkarî di gel Saziya Xebata Dijî Madên Hişber hatiye kirin.

Lewra ragirtina wan alîkariyên malî ji aliyê nawendên têkildar bi xebata dijî madên hişber ve, bi taybetî ji aliyê "Nivîsîngeha dijayetî di gel madên Hişber ên NY" ve, hekî nekare li ser kêmkirina hijmara îdaman bi bandor be, aliyê kêm dikare pirestîja wan di warê astê rêzgirtina ji mafê mirovan jêhel bibe, û hem jî dikare vê hêza yekgirtî a cîhanî ku bi dijî rejîma Îranê pêk hatiye, li rastaya berdewambûna wan li ser zext û givaşên bo ser rejîma mirovkuj a rejîma Îranê bihêztir bike, ku ew yek bêguman hêvî û daxwaza xelkê şoreşvan ê welatê me ye.

www.arsivakurd.org



## Heyetek PDK Îranê di rê û resma rêzgirtin ji Kunsolê Firansa li Hewlêrê de beşdarî kir

**Heyetek PDK Îranê di rê û resma dawîhatin bi dema karê "Dr. Firîdrîk Tîso" Serkonsolê Firansa li Hewlêrê beşdar bû.**

Berwar 30'ê Tebaxa 2012'an, rê û resmek rêzgirtinê ji birêz "Dr. Firîdrîk Tîso" Serkunsolê Komara Firansa li Hewlêrê bi boneya "dawîhatin bi erkê navbirî li Herêma Kurdistanê" birêve çû û liser gaziya fermî a Kunsolê Firansa, heyeta PDK Îranê bi serperestiya birêz "Hesen Şerefî" Cihgirê Sekreterê Giştî yê partiyê beşdarî kir.

Di rê û resmê de fîlmek dukomentarî li ser kar û çalakiyên Dr. Firîdrîk hat nîşandan û komelek kesayetiyên herêma Kurdistanê û herweha Dr. Firîdrîk peyamên xwe pêşkê kirin.

Piştre xelata birêz "Mistefa Hicrî" Sekreterê Giştî yê PDK Îranê ji aliyê birêz "Hesen Şerefî" ve pêşkêş bi Dr. Firîdrîk Tîso hat kirin.

Heyeta PDK Îranê di wî rê û resmê de li gel çendîn kesayetî û balyozên welatên biyanî li herêma Kurdistanê hevdîtin pêk anîn.

## Heyetên sê partiyên PDK Îranê, Komele û PYDK Sûriye li Hewlêrê civiyan




Du heyetên PDK Îranê û Komeleya Şoreşgêrên Zehmetkêşên Kurdistana Îranê roja Duşemî, berwar 3'ê Îlona 2012'an, li binkeya Deftera Siyasî a PDK Îranê li bajarê Hewlêrê pêşwazî ji heyetek Partiya Yekîtiya Demokrat a Kurdên Sûriyê li bajarê Hewlêrê kirin.

Birêz "Ebû Sabîr" endamê Mekteba Siyasî yê PYDK Sûriyê li Hewlêrê bi boneya rêkkevtinnameya PDK Îranê û Komeleya Şoreşgêrên Zehmetkêşên Kurdistana Îranê bi germî pîrozbayiya xwe pêşkêşî wan du partiyan kir û bi cihê keyfxweşiya xelkê Kurdistanê û herweha bi gavek girîng bo giştî hêz û aliyên siyasî û dostên tevgera Kurdî zanî.

Nûnerên her du partiyan, birêzan Tahir Mehmûdî û Necmedîn Gulperwer, tevî nîşandana keyfxweşiya xwe ji seredana wê heyetê, xalên wê rêkkevtinnameyê şirove kirin û li ser qahîmkirina pêwendiyên navbera PDK Îranê û Komeleya Şoreşghêrên Zehmetkêş ên Kurditsdan Îranê pêdagirî kirin.

Di rewşek dostane de, her sê heyetan di basek siyasî de, pirsên Sûriyê û Îranê anîn ber bas û şiroveyan.

Rojev

# Remza serkevtinê, tifaq e

**Newroz Bawer**

Yêkrêz kirina nava mala Kurd, desteber kirina mafê çarenîvîsê ye.

Li rojhelata Kurdistanê pêngavên dilxweşker têne avêtin û kiryarên hevkarî û hevxebatiyê di nava çeperên berxwedanê de xwe bihêztir dikin.

Her wek tê zanîn PDK Îranê di van demana da xebatek xurt dike ji bo pêkanîna kongira xwe ya 15'an.

Her wusa lihevhatin û rêkevtina di navbera her du hêzan, PDKÎ û KOMELÊ da dilê dostan xweş dike û tirs û lerzê dixe nav dilê rejîma kevnepereste Komara Îsalamî û hizrên ku mafnenasên gelê Kurd û Kurdistanê ne.

Pêngaveke wusa pir bi rumet ku ji aliyê sekretêrên tekoşere her du aliyan, rêzdaran Mistefa Hicrî û Ebdullah Muhtedî ve hatiye avêtin, di qonaxa îro da gelek dîrokî ye û cihê keyfxweşiya her Kurdekê ye û bi xasma li Rojhelata Kurdistanê moral û hêviya gelê me berztir û bihêztir dike.

Di qonaxekê wusa da rewşa cîhanê û devera Rojhelata Navîn û bi xasma ew welatên ku Kurdistan di nava xwe da perçe kirine, vê tifaq û hevxebatiyê hewcedar dike. Dîrok ji bona desteber kirina mafê çarenivîsa netewî û bidestve anîna mafên siyasî û civakî û çînayetî û cinsî vê erkê di ser hêzên Kurdistanî li rojhelata Kurdistanê da, wek erk dadisepîne.

Bê guman erkê hêzên berpirsiyar mezintir e. Ev pêngava ku di navbera PDKÎ û KOMELÊ da hatiyê avêtin wê bibe stûna bingehiyê xebata kom û rêxistin û hêzên Kurdistanî li Rojhelatê.

Pêymana di navbera herdu hêzan da, bi vekirî ji bo qonaxên xebata dûr û nêzîk e, tevgera rizgarîxwaze Kurdistanê bi xalên destnîşan kirî wek erk dispêre herdu aliyan.

Ev karekî hêsan nîne, desteber kirina berhemên vê rêkevtinê dilsozî û li hevbaweriyek pir bihêz dixwaze.

Ez bawer im rêvîngên rêbaza Qazî, Qasimlo û Şerefkendî, vê yêkê texsîr nakin, her wusa ez bawer im ku her du alî, wê delîvê nadin gurgên dev bixwîn ku di vê dema bi mij û dûman da bi ya dilê xwe bikin.

Bi xasma ku niha pêşkevtinên ku li Başûra Kurdistanê çêdibin, hevxebatiya ku di navbera hêzên kurd li Rojavayê Kurdistanê da pêkhatiye, di dema hilweşandina text û bextê Esadê xwînrêj û rejîma Beisa Suriyê, di ser netewa Kurd da di nav mala Kurdan da tifaqê dadisepîne. Ji xwe me Kurda jî, ji bilî vê ku di nava mala xwe da rêzên xwe bikin yek, çi şansekî dinê nîne û eger ku em vê delîva dîrokî jî ji dest bidin, gelek mixabin.

Di salvegera 67'mîn saliya damezrandina HDK Îranê da baştirîn xelat e jî bo şehîdên sorxelate Kurdistanê. Ji ber ku gel li armancên pîroz nêzîktir dike.

Her wusa pêngaveke dinê ya rêveberiya PDK Îranê di van rojana da, ku ber bi 15'mîn Kongira xwe diçe, biryara vê dane ku dest bi gotibêjê di navbera xwe û ew hevalên ku 6 salan berî niha ji nava refên wan da cuda bibûn, bikin. Armanc ew e ku di nava mala xwe da tifaqê cihgîr bikin, xwe ji caran bi hêztir bikin.

Ji bona vê pêngavê jî destxweşiyê ji rêveberîya PDKÎ dikim.

Bê guman dema wê di ser da çûye, ku nesaxiyên xweperestiyê û berjewendiyên kesayetî, bikare pêşiyê ji hevxebatî û hevsengeriya berxwedan û tekoşînê bigre. Dîroka 67 saliya PDKÎ ku her tim di nava qada xebatê da berxwedaye û xwîna Pêşewa Qazî Muhemed, Qasimlo û Şerfekenî belgenama haşahilnegirê vê rêbazê ye, ku her tim ji bon berjewendiyên gel û netewî, li hemberî dagîrkerên Kurdistanê da stuxwar nebûne.

Di dîroka Hizbê da ev bûyerana dem-dem serhildane, Hizbê di temenê jiyana xwe ya 67 sal xebata bêrawestan da, selimand ku dibe ji bilî hevxebatiyê û hevsengeriyê, çi luksekê me kurda nîne di qada xebatê da.

Ez hêvîdar im ku ev lihevhatine misoger bibe û tevgera Rojhelata Kurdistanê ji caran bihêztir be.

Ev erkekî dirokî ye. Nexşe li me Bakûriyan be!

Her wusa serkevtin ji bo 15emîn Kongraya PDK Îranê dixwazim.

Nivîsa han ji malpera **dengeazad** hatiye wergirtin



# Şevitandina daristanên rojhilata Kurdistanê



Moitesem Nûranî



Hemû salekê bi hatina demsala germê, bi sedema şevat û giringînedana karvançî, şivan û rêvîngan ve, beşek zaf ji daristan û çergeh û xwezaya Kurdistanê ji nav diçin.

Bi rastî jinavçûna çergeh û daristanên Kurdistanê bi wateya jinavçûna samanên xwezayî ên Kurdistanê ne. biniya çiyayê Zagrosê bi hemû cur şînahî û daristanekê hatiye dapoşîn, bi avayekê ku nêzîk bi 1800 cur dar têde şîn dibin ku taybet in bi derdora çiyayê Zagrosê, darên weke Darberû, Gûz, Badam, Dareben, Hirmî, Rez û hemû cure dareke kîvî. Di beşek zaf ji sînorê Turkiye û Îranê de, û herweha bi dirêjahiya sînorê navbera rojhelata Kurdistanê û Başûrê Kurdistanê de ev darên han dikevin berçavan. Dr. Qasimlo di Pîrtûka Kurdistan û Kurd de, amajê bi rewşa çêrgehan Kurdistanê dike û dinivîse ku %32 ji axa rojhelata kurdistanê bi çêrgehan ve hatiye dapoşîn û xemilandin. Herwek em dizanin ku derdora çiya û daristanên kurdistanê xwedî av û hewayek paqij û sazigar in, xelkê derdora lêrewaran jî li rewşek baştir de ne, di warê saxlemiyê de heya xelkê bajarên ku nawenda pîşesaziyê ne, û tijî ne ji dûkela tirimbêl û karxaneyan. Çûnkî daristanan çend taybetmendiyên taybet bi xwe hene û weke fîltêra hewayê, derdora xwe paqij dikin, $CO_2$'ya derdora xwe hildimije, û gaza $O_2$ ji xwe dide der, û herweha ji lezî û tundiya ba û tofanan kêm dike. Mixabin hem di dema şerê 8 sale di navbera Îran û Îraqê de, û hem jî piştî şer bi hêceta evê ku lêrewarên kurdistanê sitargeha hêza pêşmerge ne, rejîma Komara Îslamî başek zaf ji wan çêrgehan ji rêya topbaran, şevitandin û birrînê ji nav birin û herweha ji aliyê din ve hişkesaliya berdewam di çend salên derbazbûyî de, zirarek zaf gehandiye xwezaya kurdistanê.

Hilkevta cuxrafîya Kurdistanê bi avayekê ye ku, abûrî û jiyana piraniya xelkê Kurdistanê,

pêywendiyek qahîm û rasterast bi jîngeha Kurdistanê ve heye. Rewşa xweza û helkevta cuxrafiyayî a kurdistanê ji bakûr ve heya ku ber bi başûr ve diçe, bi awayekê ye ku hem di warê nasîna çiyayan û hem jî di warê nasîna av, şînahî, û daristanan ve peywendiyek qahîm bi hevre hene û xweza û jîngeha Kurdistanê digel jiyana kurd hatine têkelkirin.

Pêvajoya şevitandina daristanan di du sê salên derbazbûyî de ber bi zêdebûnê ve diçe, bo mînak li gor gotina berpirsyarê beşa çavkaniyên xwezayî ên Kurdistanê, di despêka sala 1390'an de heya niha pitir ji 570 caran şewat ketiye nav lêrewar û daristanên Parêzgeha Kurdistanê û bûye sedema zirarên zaf ên xwezayî. Bitaybet piraniya şevatan ji herêmên sînorên Merîwan û Sewlawa rû dane, ku eva jî cara yekemîn nine şevat dikeve nava wan daristanên Merîwanê de. Herêmên din jî li Parêzgeha Îlamê heya digîje çemê Eres ji şevatê bêpar nebûne. Di salên derbasbûyî de take hêceta Komara Îslamî ji bo şevitandina daristanan, hebûna hêza pêşmerge bû, lê niha pêşmerge tunine, lewma derdikeve ku Komara Îslamî digel Kurd û jîngehê dijberiyê dike û serbarê şevitandina daristan û lêrewaran, vê care Gola Merîwanê (zirêwer) jî jehir dike, û dixwaze bi vî awayî dijberiya xelkê Kurd bike.

Xelkê Kurdistanê dixwazin bizanin ev kê ye ku karek weha xirab û şaş dike da ku bikarin bigirin û cezayê jêre diyarî bikin,lê Komara Îslamî derheq şavitandina daristan û lêrewarên Kurdistanê de ne tu kesî digire ne jî tu kesî siza dide.

Lê niha eve cihê tekezê ye ku di dema berewaniya hêza çekdar a pêşmerge de, maşîna şer a Komara Îslamî xwe digehand bilindahiyên Kurdistanê, lê niha serbarê teknolojiyên serdem û îmkanatên pêşketî, tu hewlekê li dor wemirandina şewatê di daristanên Kurdistanê de nade. Bêguman destê kirêgiretiyên rejîmê di agirberdana daristanên Kurdistanê de heye û roj niye ku di herêmên sînorî de kasibkarên kurd nedin ber gulleyan û şehîd nekin.

Lewma dibêjim hekî nifşa derbazbûyî li hember êrîşa leşkerên dûjmin de singê xwe dikirne mertala gulleyan û berevanî ji man û hebûna xelkê Kurd dikirn, dibe nifşa îrorojê jî, weke erkek netewî û nîştimanî pêşiya şevitandina xwezaya Kurdistanê bigrin, û jîngeha Kurdistanê biparêzin.

Erkê dezgehên ragehandina Kurdî ye ku li warê jîngeparêziyê de, pirsa şewitandina daristanên Kurdistanê, weke mijarek girîng û heyatî bînin ziman û civaka xelkên Kurdistanê ji karesatek weha tirsnak haydar bikin.

# Tawanek bi hêceta ol



Fatih Salihî



Avakirina jiyana hevpar nîşan û hêmaya selimandina hêviya bi jiyanê di civakên cur bi cur de ye. Eva jî rasterast vedigere ser çawanî û zirûfa çandî, civakî û rewşa abûriya tekên nava civkê de, yan ji hemûyan girîngtir yasayeke ku di wan welatan de tê pêrewkirin.

Lewma di wan civakan de ku yasaya welat li ser bingeha eslên mirovahiyê sekinî bin, avakirina jiyana hevpar jî bi tevahî dikeve bin bandor û siya wan pirensipên mirovî, ku li encama tendurustiya civakî de çê bûne.

Beravajiya vê yekê jî, di civakên paşvemayî de, nirx û buhayek mirovî weke pêkanîna jiyana hevbeş, dikeve bin bandora yasayên paşvemayî û girêdayî bi ol û xurafatan, û eva jî dibe sedem ku di nav civakê de, ji bilî vê ku avakirina jiyana hevpar nabe hîma û sembolek ji bo zindîbûna civakî, û hebûna hêviya bi jiyanê, dibe nîşaneyek bo binpêkirina mafên sereke û afirandina tawanek mezin bi hêceta ol û mezheban.

Di welatên azad û pêşkevtî ên cîhanê de, bi bê lêkolîn û nirxandin û ravekirinê tu caran dest ji pêkhateya civakî nadin.

Li ser vê bingehê hekî pirogiram yan pilanek civakî ji aliyê dewletê ve bihê pêşniyarkirin, pêşniyara han piştî derbazkirina bi dehan qonaxên yasayî û bi rapirsî di navbera takên civakê de, dibe yasa û dikeve ser hêla cî bi cî kirinê, bitaybet li warê jiyana hevbeş de, yasaya malbatî di wan welatan de bi qasekê bi hûrbînî ve hatiye darêtin ku heya dikare rê ji bêserûberiyên civakî û çandî di civakê de bigre.

Lê mixabin di civakek belalêdayî û pir ji arîşe wek Îranê de ku ol bûye gopalek di destê mirovên bi nav olî de, bo afirandina tawan û kiryarên dûr ji mirovahiyê, jiyana malbatî û pêkanîna jiyana hevpar xwedî girîngiyek weha niye û wek mijarek hewce nahê hesibandin.

Welatek ku %70 ji nifûsa wê ji texa ciwan, ew jî ciwanên bê kar û bê cihê jiyan û dahata rojane pêk tîne, çawa dikarin ku kesek din jî tevlî jiyana xwe ya pir ji êş û azar bikin, û bibin xwedî malbat û zarok.

Di nava van hemû pirs û babetên girîng ên weke paşvemana çandî û rewşa aloz a abûrî, civakî û heta siyasî di welatê Îranê de, avakirina jiyana hevpar a zarokan yek ji wan diyardeyên qirêj ên civakî ye, ku çavkanîgirtî ji ol û sunnetê ye, û eva jî rasterast bandorê dixe ser nifûsa 16 milyon kesî li Îranê de, ku li gor ol û ew yasayên ku di hundirê welat de tên birêvebirin, dikarin jiyana hevpar pêk bînin.

Li gor amarên nû, bi giştî ev kesên ku temenê wan di navbera 10 heya 19 saliyê (bi giştî 15.4 milyon kes) de ne, 6.7 milyon kes di navbera 10 heya 14 saliyê û 7.8 milyon kes jî di navbera 15 heya 19 saliyê de ne.

Ji vê nifûsê nêzîk bi 890 hezar zarokên ku temenê wan di bin 18 saliyê de ne, bi zorî û neçarî jiyana hevpar bi ser wan de hatiye sepandin. Di navbera nifûsa 10 heya 14 saliyê de, 78 hezar kes, aliyê kêm carekê jiyana hevpar ava kirine.

Ji aliyek din ve serjimêrî didin xûyakirin, ku li girûpa temenê 15 heya 19 saliyê de, 814 hezar kes zevicî ne. Ev rewşa aloz a civakî hemû vedigere ser zirûfa niha ku bi hêceta ol û sunet bi ser civaka Îranê de hatiye sepandin, û roj bi rojê goriyên xwe disitîne, û mixabin cudabûn û telaq geşe dike, û bi heman pîvanê hejarî û xirapî jî zêde dibe.

Hevpeyvîn: Arif Vêlzî

# ”Ger Pasdark 6 pisteyan bide min, ezê Çek û rextê xwe danêm û vegerim mala xwe”



Rehman Mihemedzade, naskirî bi Rehmane Kurde, kurê Feqî Kerîm, sala 1333'an li gundê Siyader a ser bi bajarê Seqizê hatiye dine. Wekî her zarokek din temenê xwe yê zarokatiyê derbas dike û dibe nûciwan. Li wî temenî de ye ku hest bi berpirsatiyê dike û mijûlê kar bo malbata xwe dibe. Di sala 1347'an de, seba kar û kasibiyê diçe Başûrê Kurdistanê û heyamê 10 salan li vir dixebite.

Ji ber ku babê wî pêşmergê şoreşa Şêx Mehmûdê Berzencî bûye û berdewam basa xebat, siyaset û bêmafiya kurdan bo zarokên xwe re kiribû, lewma hesta netewî li dil û derûna Rehmane Kurde de berdewam li hale ajardanê de bûye. Dem derbas dibe heta ku şoreşa gelên Îranê rû dide. Wê demê ji başûr ve vedigere bo rojhilatê kurdistanê û serbarê wê ku xwendewar nebûye, lê bernameya PDKÎ diecibîne û hest dike ku PDK Îranê partiya hejar û feqîran e û dê bikare mafên kurdan bidest bixe. Eve dibe sedem ku li yekemîn komîteya partiyê li Banê de wekî endam xwe navnivîs bike û dest dide xebata xwe ya siyasî.

Li destpêkê de tenê wekî endam çalakî meşandine, lê piştî fermana cîhad a Xumênî û şerê Sê Mange bi awayek fremî çeka pêşmergatiyê xiste milê xwe û heya niha jî bi dilgermî ve berdewam e li ser xebata xwe li nav refên PDK Îranê de.

Kek Rehman sala 1357ê, li Bajarê Bane de tevî Xunçe Kerîmî jiyana xwe ya hevpar destpê dike. Lê di yekemîn şeva zewicîna me de topbaran û bombebarana derdora me destpêkir û em ji hev veqetiyan. Heya midehê 25 rojan hevjîna min ji min wunda bû, lê paşan me hevdu dît.

Kurde bîranînên xweş vegêrandin ku yek ji wan ev e: Sala 1366'ê di navbera demsalên Zivistan û Buharê de em li çiyayên Bane de bûn ku hêzên Komara Îslamî hatin û em dorpêç kirin, pêşmergeyek xweşbêj û qisexoş bi navê Elî Seqizî jî di gel me bû, fermanderê me pêşmergan re got ku dibe em niha vê hêza dujmin bişikînin. Elî Seqizî jî di bersiva Fermande de got; fermandê me gelek ecêbe! çûnkî hekî niha pastarek Îranê bê û 6 pisteyan bide min, ezê çek û rextên xwe bidemê û vegerim mala xwe, em bi vê gotinê pir keniyayn û rabûn ser xwe û me boseya hêzên dujmin şikand bêy ku em şehîd an jî birîndarekê bidin û cardin çiya ketin destê pêşmerge de. Ew serketina me pir xweş bû û bû sedem ku her di çiya de em cejn û govendê bigrin.

Li hemberî wan rojên nexweş de Kurde bîreweriyên tal û bijan ên xwe jî zaf hene û roja herî nexweş a jiyana xwe ya pêşmergatiyê weha anî ziman; ez taze ji menteqê vegeriyabûm Qendîlê ku Kak Mistefa Hîcrî şand pey min û got dibe wekî çawsax û beled tev hêza Melbenda 2 cardin vegerî menteqê. Em bi rê ketin û çûn kûrahiya axa Kurdistanê. Demjimêr 10'ê sibê bû, me nanê têştê dixwar ku daxûyaniya şehîdketina kak Dr. Qasimlo me bihîst. Nan xwarina me bûye şîn û girî, roja herî nexweş a jiyana min ew bû. Her bi vê boneyê ez heya niha jî di nava refên PDKÎ de berdewam im li ser xebata xwe, çûnkî li Qendîlê midehek zaf wekî parêzer û îskort di xizmeta şehîd Qasimlo de bûm û min ew wekî babê xwe dihesiband, lewma niha jî ku tê bîra min çavên min rondikên keserê dirêjin.

Hêviya min ew e ku xelkê kurdistanê her weke heta niha piştewanê partiyê bûne, niha şûnde jî her piştewan bimînin Ji ber ku partiya Pêşewa, Dr. Qasimlo û Dr. Şerefkendî ye. Silav ji her çar perçen Kurdistanê.

Kurde: Di destpêka pêşmergatiya xwe de heya niha 8 caran hatime birîndar kirin û ji mirinê filitî ye.

**_Midehekî zaf li Qendîlê ez parêzer û îskortê Dr. Qasimlo bûm_**





Ehmed Ferecî kurê Mihemed Şerîf, sala 1342'an li bajarê Nodşê hatiye dinê. Temenê zarokatiya xwe hêdî hêdî derbas dike heta ku malbat wî dişînin ber xwendinê. Heya sinfa sê a navendî xwendina xwe didomîne. Paşan dev ji xwendinê ber dide û mijûlê kerê dukandariyê dibe heya ku temenê wî digîje 18 saliyê.

Paşan bi neçarî diçe serbaziya Îranê ku hevdem bûye di gel şoreşa gelên Îranê, ji leşkeriyê direve û xwe digehîne bajarê xwe û êdî venagere.

Ehmedê xebatkar despêka nasîn û tevlîbûna xwe bi PDKÎ weha bo Agiriyê wedigêre; dema şoreşa gelên Îranê bi encam gihîşt, tewaya xelkê Kurdistanê ji xwendewar û nexwendewaran û piraniya tex û qatên civakê piştewanî ji PDK Îranê dikirin, herweha kak Heme Seîd Kalkal Ku endamê PDK Îranê bû û hertim digel Kak Dr. Qasimlo de bû, xelkê Bajarê Nodşê bû û dihat mala me û bas ji siyaset û karê PDK Îranê dikir. Bi vî awayî min PDK Îranê naskir û sala 1360'an li derdora Defterê min xwe bi meqerê partiyê nasand û çeka pêşmergatiyê ji Kak Hekîm Rezayî wergirt û bi awayek fermî bûme pêşmergê PDK Îranê.


Kak Ehmed Ferecî roja herî xweş a jiyana xwe weha tîne ziman; dema ku Hêzên PDK Îranê li bajarê Helebçê ketibûn nava dorpêçê de, Dr. Qasimlo gotibû ez tu tiştekê naxom heya ew hêza mezin ya PDK Îranê rizgar nebe. Dema ku xeber pêre anîbûn ku hêzên partiyê karîne ji vê rewşê rizgar bibin, gotibû nan û ça û maşînan amade bikin û bi xwe jî bi wan re çûbû Qislanê û li wir bo pêşmerge û xelkê wê deverê axivî. Wî di axaftina xwe de keremkir: min çar roje tu tişt nexwariye, lê niha bi we re bi rihetî dê nan bixom, li dû xwarinê de jî em xelat kirin. Di vê rojê de em pir keyf xweş bûn.

Roja nexweş a jiyana Ehmed Ferecî du roj in, roja yekem ew e ku piştî Kongireya 8 li herêma Seqizê, kak Hekîm hat şehîd kirin. Şehîd ketina navbirî bandor xist ser min û ez pir nerihet bûm. Ya duyem ew e ku sala 1372'ê, dema ku kak Mistefa Hicrî diçe seredana meqerên hêza Şinoyê, di dema vegeriyanê de şehîd Sitar Celalî kak Mistefa re dibêje, hinekê bisekine heya ez diçim û rê diceribînim, paşan hûn jî li dû min de werin, di wê pêşengî û rêxweşkirinê de, dikeve ser mîn (mayîn)a çandî a kirêgirtiyên Komara Îslamî û mixabin canê xwe ji dest dide û şehîd dibe.

Kak Ehmed di dema kîmyabarana Helebçê de, mixabin dikeve bin bandora çeka kîmyayî û heya niha jî ji dest êş û azarên wê de dinale.

31 sal bi ser temenê xebata Ferecî de derbas dibin, lê hêj nezewicî yê û li hizra wê de jî nine. Helbet em ji vegêrandina serhatek evîndarî a xwe bêpar nehêlan û domand. Li Nodşê min û qîzek bi navê (M, S) hej hevdu dikir, min malbata xwe şand xwastinê û keçik dan min, lê roja din şer destpêbû û Nodşe ji aliyê hêzên Komara Îslamê ve hat girtin û bavê keçikê bû caş û got ez keça xwe nadim te. Lewma heya niha jî em ji ber wefadariyê û eşqa paqij û ji dil, em nezewicîne û hertim bi hêviya hevdu ne.

Kak Ehmed bi vê gotinê dawî bi axaftina xwe anî û got: ez hêvî dikim ku PDK Îranê ji xabata xwe berdewam bimîne û nehêle xwîna şehîdan bi xisarî here û herweha dilê zîndaniyên siyasî û malbatên şehîdan rabigre.



**_jiyana xwe weha tîne ziman; dema ku Hêzên PDK Îranê li bajarê Helebçê ketibûn nava dorpêçê de, Dr. Qasimlo gotibû ez tu tiştekê naxom heya ew hêza mezin ya PDK Îranê rizgar nebe._**

Hejmar 190, 5'ê Îlona 2012

# Şaristana Seqizê



Mecîd Cinîkanlû

Seqiz bajarekî kurdan e ku li parêzgeha Sinê li Îranê hilketiye.

Hejmara nifûsa vî bajarî, 205.250 kes e. Seqiz bajarekî dîrokî ye. Dîroka wê li gorî arkeologan vedigere bo 2000 salî berî niha. Navê Seqizê ji navê Sekka ku navê hozeke kevin e, hatiye wergirtin, ku li çaxên kevin de li wê herêmê de dijiyan.

Bajarê Seqizê navenda Şaristanê ye û ew Şaristan xwediyê bajarekî din a bi navê Sahib e. Şaristana Seqizê li bakûr li gel bajarê Bûkanê, li rojhilat li gel bajarê Dîwanderê, li başûr li gel bajarên Merîwan û Banê hevtixûb e. Herwisa li aliyê başûrê rojava, bajarê Seqizê li gel başûrê Kurdistanê hevsînor e. Şaristana Seqizê li sê herêmên Navendî, Zêwiye û Serşêw pêk tê.

Bajarê Seqizê li ser du giran û li cem çemê Welî xan hilketiye, û çemê Sîmîne jî li qerax bajêr de derbaz dibe. Ev yek bedewiyekî bê qas ciwan daye bajar, û her seba wê yekê bajarê Seqizê xwediyê av û hewayekî xweş e. Gelê herêmê hemû Kurd in û pitir li gundan bi karê werzêrî û ajeldariyê re mijûl in. Ajeldarên herêmê li deşt û çiyayên Benefşe, Garîn, Çil Çeme mijûlî karê pezdariyê ne. Her seba vê yekê ew herêm xwediyê cihê baş ji bo xwedîkirina heywanan e, û li herêmên wek Xurxure û Serşîwê gelek cih ji bo peydakirina debara jiyanê peyda dibin.

Li herêmê de 240000 hiktar cihên daristan û erdên çandiniyê hene. Di wan çiyayên bedew bi dehan çem û kanî diherikin ku ên herî girîny pêk hatine ji: Çemê Cexetû, Xurxure, Welî Xan, Altûn û Tetehû ku piraniya wan piştî têravkirina deşt û newalên Seqizê dirêjne nav gola Urmiyê.

Dîroka bajarê Seqizê ji bo 7 hezar salan berî Zayînê vedigere. Ji asevarên ku li girê Zêwiye bi dest hatine ,vê yekê nîşan didin ku yekem hevgirtina Madan li wê herêmê de bûye û bi destê wan li herêmê çendîn Kel hatine çêkirin ku kela Zêwiye û Qeplantû li wan cihan in, ku wan çêkirine. Piştî êrîşa Sarkin, Şahê Aşûr li ser Madan, Mad bi neçarî ber bi Hemedanê çûn û Seka hatine Seqizê û wir wek navenda deshilata xwe ava kirin. Navê îroyîn yê bajarê Seqizê li Seke, Seka, Êskît, Sakiz, Sikiz wek yadigarekê ji bo me bi cih maye, û îrorojê gel wî bajarî bi navê Seqiz dinasin.



***Paş têkçûna Komara Kurdistanê, 11 kes ji Xan û Serdarên herêma Feyzûlabegî a Seqizê seba Alîkariya tevî Komara Kurdistanê hat şehîd kirin***

Bi her awayekî be Seqiz yek ji bajarên herî kevin yê Kurdistanê ye û di dîroka neteweya me de cihê xwe yê taybetî hebûye û heye.

Li serdemê Sefewiyan heya Serdemê Qacaran, mîrnişîna bi nav û deng ya Erdelan li wê herêmê deshilat hebûne û rolekî mezin di avedanî û ewlehiya herêmê de lîstine.

Li şaristana Seqizê pitir ji 150 asevarên dîrokî hene ku seba siyasetên dewleta Îranê tenê du asevarên wî bajarê li rêza asevarên netewî yê Îranê de hatine nivîsandin.

Kela Zêwiye:

Kela dîrokî ya Zêwiye ku li zaf pirtûk û belgenameyên dîrokî de navê vê hatiye, li 55 kîlomêtriya başûrê rojhilatê Seqizê û li bakûrê gundê Zêwiye cih girtiye. panahiya kela han çar hiktar e. Dîroka vê jî ewa ku heta îro hatiye zanîn ji bo 7 hezar sal berî zayînê vedigere.

Şikefta Kereftû:

Şikefta Kereftû yek ji asevarên herî bedew û cihê ecêbê yê wê herêmê ye. Şikefta han li nav kevirekî bilind li nêzîk gundên Mehmûd ava, Mîr Seîd û Elî ava hilketiye. Kereftû wek yek ji asevarên herî kevin yê Îranê tê binav kirin û her salê bi sedan kes li seranserî Îranê serdana herêmê dikin. Tê gotin ku heya îro jî kesê nekariye dawiya wê Şikeftê peyda bike.

Kurdên Seqizê li şoreşa rizgarîxwaziya gelê Kurd de rolekî gelek baş hebûne, û di vê riya pîroz de gelek nirxên baş pêşkeşî neteweya me kirine. Li serdemê Komara Kurdistanê a 1945'ê li bajarê Mihabadê, xelkê Seqizê bi awayekî gelek ektîv beşdarî damezirandina Komara Kurdan bûn û heta dawîn dilopa xwîna xwe berevanî ji destkevtên Komarê kirin.

Paş têkçûna Komara Kurdistanê, 11 kes ji Xan û Serdarên herêma Feyzûlabegî a Seqizê seba Alîkariya tevî Komara Kurdistanê û beşdarî li damezirandina Komarê û her wisa şer li dijî hêzên Îranê, bi sûçê Azadîxwaziyê hatin Şehîdkirin. Ew yek li dîroka xebat Azadîxwaziya Netewa Kurd de bi başî hatiye nivîsandin û destana berxwedan û helwêsta dayîka wan şehîdan (Zerefşan xanim) û cesareta wê wek rûpelekî zêrîn di dîroka Kurdan de heta îro maye.

Di çaxekê de ku çend kurên Zerefşan Xanimê bi destê Serbazê Şahê Îranê hatine bidarvekirin, navhatî destê xwe li xwîna serçavên xwe dide û li serçavên bê can yê kurên xwe didie! çaxê ku fermanderekî Artêşa Îranê jê dipirse çima tu wî karî dikî? Ev dibêje ku kurê min yê şêr seba vê yekê ku miriye, rih li canê wî de nemaye û rengê wî zer bûye, ez wisa dikim ku hûn nefikirin ku kurê min tirsiya be! ew netirsiya ye, ew şehîdê gelê xwe ye.

Bê guman Seqiz û Seqizî di dîroka azadîxwaiya gelê Kurd de xwedî hezaran Serdarên wek Feyzûlla Begiyan û hezaran dayîkên wek Zerefşan Xanimê ne. Eger wisa be Serkevtin û pîrozî her ya Kurd û Kurdistanê ye.




www.arsivakurd.org

# Hunermend "Mihemed Riza Seqayî"



A: Eskender Ceiferî

Hunermend Mihemed Riza Seqayî, li 9'ê Nîsana 1939'an li malabatek destkurt li herêma Xurem Abadê ji dayik bû. Navê Babê wî Ebulqasim bû ku her di temenê zarokîniya wî de nekarî hewcehiyên jiyana wan dabîn bike, lewma Mihemed Riza bona peydakirina bijêva jiyanê, çû cem terzî(xeyat), bona ku hînî dirûna kincan bibe.
Hilkêş û dakêşên jiyanê Mihemed Riza tevî rewşek ne baş berbirû kiribû û Riza wisa digfikirî ku îdî heya dawiya jiyana xwe nikare jiyanek baş hebe.
Wê demê bû ku kesek bi navê "Îzed Penah" bû berpirsê Îdarya Çandî anku Îdareya Ferheng a wê demê a Luristanê.
Riza tevî ku Xeyatî dikir, dersa xwe jî dixwend.
Vedenga dengê Riza zû li Luristanê vepêçiya. Di wê demê de bû ku Îzed Penah haydar bû ku nûgihayek dengxweş heye ku xeyatiyê dike û di rewşek ne baş de ye. Îzed Penah diçe Durûngeha (xeyatî)wan û jê re dibêje ku hin Kilaman ji bo min bixwîne û Riza disitire. Îzed Penah gelek ji dengê wî tê hez dike, lewra biryar dide ku wî bibe Îdareya Çandî a Navenda Xurem Abadê.
Mihemed Riza zû karî cihê xwe di nav Koma Fêrkariya wê Îdareyê de veke.

Pêşdaçûna Riza vedigere ser dilsoziya Îzed Penah ji bo Çand û Mûsîqiya Lurî û Kurdî. Îzed Penah di roja 5'ê Nîsana Sala 1965'an de daxwazê ji Fermandariyê dike da ku Gurûpa Mûsîqiya Lurî a Îdareya Çandî a Xurem Abadê biçe radyoya Tehranê û li wêderê bi awayekî zindî beşdarî pirogramê bibin.
Riza Seqayî piştî heyamekê ku ji aliyê Fermandariya wê demê a Xurem Abadê ve diçe Tehranê, li wir di warê muzîkê de gellek pêş dikeve.

Berhemên Mihemed Riza:
Sitranên "Dallig, Asiman, Şah Damad, Halû û Genim Xir, Firişte, Bizranû, Daye Daye, Mîrî û..." ji berhemên navdare wî ne ku hemû ji encama kar û xebata bê rawestiyan ya Riza Seqayî bûne.
Sitrana "Daya Daye" ji giştan Hemasîtir û Şoreşvanîtir bû û di meşa bi djî Rejîma Şa de bandor li ser derûna xelkê didanî. Her ev Sitran weke sitrana Mîratînî a sed salên wê dawiyê a Îranê, çûye nava Dîroka gelê Kurd û bi xasmanî xelkê Luristanê de.

Mihemed Riza di jiyana xwe de hazir nebû demekî kurt jî, bo Rejîma Komara Îslamiya Îranê serî datevîne û her timî got ku ez razî nînim Komara Îslamî, Mifahek Teblîxatî ji min û Hunera min wergire.
Mamostayê mezine Mûsîqiya Kurdî a devera Luristanê li Sala 1999'an di gotûbêjekî tevî Kovara "Herfê Lur" de li ser zulm û zoriya Komara Îslamî li ser Çandên jêrdeste Îranê tekez kiriye.

Mamosta Riza Seqayî di jiyana xwe de nezewicî û her weke bi xwe dibêje, Dengê wî, Jina wî û Zarokên wî, heman sitranên Daya Daye û Dallig û Tifeng in.
Muxabin serbarê viya ku di şerê Îran û Îraqê de birîndar bibû, lê rawestiyana Dil kar lê kir û ew tûşî nexweşiyek pir giran kir.
Hunermend Derwîş Riza Munezemî dibêje: Divê berpirsên Çandî, zaftir bala xwe bidin xwedîhunerên kal û hewce ye zaftir ji aliyê Meinewî ve bi wan re bigîjin ji ber ku niha kesek çinîne ku ji wan parêzvaniyê bike.
Bo mînak niha Xwîşka Riza Seqayî li bal wî ye û haydariyê jê dike.

Muxabin Riza di roja 18'ê Tîrmeha Sala 2010'an de li Tehranê çû ber dilovaniya xwedê û ev dengê her tim saxe gelê Kurd, çavên xwe ji bo hertim ji jiyana pir kûr û ewraz li ser hev danîn û Netewa Kurd bi tenê hêla.
Termê bê cane wî di roja 24'ê Tîrmehê de ji bo Xurem Abadê tê veguhastin û li wêderê bi axê tê sipartin. Ji ber ku termê wî yê bê can, hest bi bêhnçikî û diltengî ji bo axa Bav û Kalên xwe neke.



## Fîlmeke Behmen Qubadî di fistîvala Torêntoyê de, wê beşdar be

**Fîlma sînemayî a Demsala Kergedenan, bi derhêneriya Behmen Qubadî di beşa 37'mîn dewra fistîvala fîlma Torêntoyê, li Kanadayê, wê biçe ser ekranê**

li gorî çavkaniyan, fîlma sînemayî ya Demsala Kergedenan ku şeşemîn berhema sînemayî ya Behmen Qubadî derhênerê jêhatiye kurd e, bi muzîka Keyhan Kelhur jenyarê navdarê Kirmaşanê û bi lîstikvaniya ekterên weke Bêhruz Visûqî, Monîka Belûçî û Birên Sat,di yekemîn hizûra navnetewî ya xwe de, bi amadebûna ekterên bi nav û dengên sînemaya pirofîşnal di 22'ê Xermananê de li beşa taybet a fistîvalaTorêntoyê, wê bê ekrankirin.

Fîlma han, pirtûka jiyana helbestvanek Kurd e ku ji riya helbestên xwe ve, li pey jiyana xwe a windabûyî de digere.



## Kaniya helbestan



### Ma min çi kiribû?

Min jî dixwast...
Min jî dixwast hez bikim

Dema ku ez amade bûm
Bi rastî ez bi hêvî bûm
Lê Evîn wenda bû

Şevek tarî de Qederê
deriyê min lêxist
Bê deng fermana min ji
paşla xwe derxist

Erd û ezman li hev ket
Xeyalên min li ber bayê kur
ket
Min fahm kir ku Qeder bi
serket

Lê demek nepayî de Evîn
vegeriya
Roj bi roj xwîna wê dikeliya
Hezkirin di dilê min de tê
diza

Li hêlekê Qeder,
Li hêlekê Evîn

Li hêlekê ferman,
Li hêlekê evînek bê derman

Dilê min tê guvaştin
Xwîna min tê mêjtin
Gelo ev zulm li kuderê
hatiye dîtin

Ma min çi kiribû ?

Ez êdî nikarim
berxwebidim...
...we diterikînim
Zimanê min nagere bêjim
Xatirê we...
**Helbestên Kurdî**


www.arsivakurdi.org

# Agirî

Duheftînameyek siyasî, civakî, çandî û hunerî ye
Ku Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê diweşîne

www.kurdistanmedia.com/kurdi
Navenda bingehîn ya xebata Agirî li Kurdistanê ye.
Navnîşana derveyî welat:
AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE
E - Mail: agiri2003@hotmail.com
agiri2003@gmail.com, rojnamaagiri@gmail.com



Gundek Bakûrê Kurdistanê

## Urmiye hatiye milîtarîze kirin

**Rejîma Îranê li jêr navê "parastina tenahiya hevwelatiyan", bajarê Urmiyê xistiye jêr çavdêriyê û bi tewahî mîlîtarîze kirine.**

Li gor rapora Kurdistanmediyayê, rejîma Îranê li ser qadan, li ser şeqaman û cihên giştî ên bajarê Urmiyê, kamêra girê dane, û hatûçûn û karê rojane yê xelkê konterol dikin.

Li gor rapora han, rejîmê bi berfirehkirina gerên hêzên xwe di nav bajar de li jêr navê "ewlehiya exlaqî", tenahiya xelkê bajrê Urmiyê pêtir ji caran xistiye metirsiyê û tirsek çend qat xistiye nava xelkê de.



Hêzên rejîmê gerên şev û roj, çawaniya lixwekirina kincan û hîcabê berteng kirine û bi tundî li gel ciwanên ku hicaba îslamî naparêzin berbirû dibin û ev karê rejîmê nîgeranî ji xelkê re pêk aniye.

Bi zêdebûna egera êrîşa leşkerî a Îsraîlê bo ser Îranê, kiryarên rejîma Îranê li deverên Kurdistanê di pêwendî li gel egera her serhildanek xelkî çend qat tundtir bûye.

Li gor rapora "Mêhr", rejîma Îranê li 300 cihan di sînorên Kurdistanê û li deverên parêzgeha Urmiyê pedafendên hewayî cihgîr kirine, û bi vî karî jî li jêr navê "tenahiya hundir û berhevkirina rewşek saxlem di sînoran de" pêtir ji caran deverên Kurditanê ne êmin kirine.

## Encama cinayetên Esed; 30 hezar kuştî û destdirêjiya ser 1600 jinan

**Heya niha 30 hezar kes ji aliyê hêzên rejîma Beşar Esed ve hatine kuştin û 1600 jin jî, ji aliyê wan hêzan ve destdirêjî li ser wan hatiye kirin.**

Serokê Konseya Şoreşa Sûriyê û yek ji kesayetiyên dijbere rejîma Beşar Esed tevî rexnekirina kar û kiryarên Konseya Ewlekariyê ya NY ragehand ku xelkê Sûriyê heya kengê divêt bibne qurbaniyê vetoya Rûsiyê.

Navbirî ku di gel televîzyona Elerebiyê gotûbêj dikir ragehand ku me heya niha zêdetir ji 30 hezar şehîdî daye ku 2500 kes ji wan zarok in,û 2200 jin jî di nav wan de hene. Wî zêde kir ku zêdetir ji 1600 destdirêjiyên cinsî li girtîgehên rejîma Sûriyê de, bi dijî jinên girtî pêk hatine, û niha me 250 hezar girtî û nêzîk bi 2 milyon penaber li navxwe

## Di Îranê de rêjeya telaqê %4.1 zêde bûye.

**Di Îranê de rêjeya zewaca ciwanan kêmtir dibe û li hember de rêjeya telaqan zêdetir dibe, û navinciya temenê keç û kuran bo zewacê jêhel diçe.**

Li gorî zanyariyan, dawî serjimêrî nîşan didin, ku di sala 1390'î de, 142 hezar û 841 telaq hatine navnûs kirin, ku li gorî sala pêşîn rêjeya telaqê %4.1 zêde bûye. Hijmara telaqên navnûskirî di nav bajaran de 121 hezar û 91 telaq, û hijmara telaqên li gundan de 21 hezar û 750 telaq bûye.
Herwusa telaqên herî zêde yên navnûskirî di nav ciwanên 25 heya 29 salî, 35 hezar telaq bûne, û di nav jinên 25 heya 29 salî, 38 hezar û 647 telaq bûne.

